

## BELAVOKA RAGEHANDÎNÊ

Ji bo vaksînekirina li dijî COVID-19 (Vîrûsa Korona 2019) – Bi vaksîna hilgir – (Vaxzevria®, berê vaksîna AstraZeneca COVID-19 ji AstraZeneca û vaksîna Janssen® COVID-19 ji Janssen Cilag International/Johnson & Johnson)

Ji 1-ê Gulana 2021-an (Ev belavoka agahdariyê bi domdarî tê nûve kirin)

### AUFKLÄRUNGSMERKBLATT

Zur Schutzimpfung gegen COVID-19 (Corona Virus Disease 2019)

– mit Vektor-Impfstoff – (Vaxzevria®, ehemals COVID-19 Vaccine AstraZeneca von AstraZeneca und COVID-19 Vaccine Janssen® von Janssen Cilag International/Johnson & Johnson)

Stand: 12. Mai 2021 (dieses Aufklärungsmerkblatt wird laufend aktualisiert)

Navê kesa/ê ku tê vaksîne kirin (Ji kerema xwe bi tîpên mezin binivîse):

Name der zu impfenden Person (bitte in Druckbuchstaben):

Rojbûn:

Geburtsdatum:

## COVID-19 çi ye?

Vîrûsa Korona bi dehsalan têne zanîn. Ji dema guhertina sala 2019/2020 ve, korona vîrûsek nû, Korona vîrûsa Sendroma giraian tenefûsî-2 (SARS-CoV-2), li seranserê cîhanê belav dibe, ku ew patojîna COVID-19 (Vîrûsa Korona 2019) ye.

Nîşaneyên berbiçavê yê COVID-19 pêk tên ji kuxika hişk, ta, bêhna tengî, û her weha windabûna bîhn û tamê ya demkî. Hesta nexweşîya giştî ku bi serê û êşa endaman, êşa qirikê, û avrêja pozê ve jî hatîye dîtin. Nexweş kêmtir dibe ku pîrsgirêkên xwarin mehandinê, werimîna multehim, û werimîna girêkên lîmfê jî tên ragehandin. Gengaz e ku paşê zirarê bigihîje rehikan an pergala dil-demar û her weha domandina nexweşiyê. Her çend nexweşî bi gelemperî sivik e û piraniya nexweşan bi tevahî baş dibin, lê bûyerên giran ên nexweşiyê, wekî nimûne nexweşîya sihan ku dikare bibe sedema mirinê jî heye.

Ji bilî pêşgirtina li nexweşiyê bi şopandina rêgezên AHA + A + L (parastina dûrbûna civakî, şopandina paqijîya kesane, bikaranîna maskê di jiyana rojane, daxistina sepna hişyariya Korona, hewakîşandina berdewama adeyê), vaksîn parastina herî çêtirê li dijî nexweşiyê radest dike.

### Was ist COVID-19?

Coronaviren sind seit Jahrzehnten bekannt. Seit dem Jahreswechsel 2019/2020 zirkuliert weltweit ein neuartiges Coronavirus, das SARS-Coronavirus-2 (SARS-CoV-2), welches der Erreger der Krankheit COVID-19 (Corona Virus Disease 2019) ist.

Zu den häufigen Krankheitszeichen von COVID-19 zählen trockener Husten, Fieber, Atemnot sowie ein vorübergehender Verlust des Geruchs- und Geschmackssinnes. Auch ein allgemeines Krankheitsgefühl mit Kopf- und Gliederschmerzen, Halsschmerzen und Schnupfen wird beschrieben. Seltener berichten Patienten über Magen-Darm-Beschwerden, Bindehautentzündung und Lymphknotenschwellungen. Folgeschäden am Nerven- oder Herz-Kreislaufsystem sowie langanhaltende Krankheitsverläufe sind möglich. Obwohl ein milder Verlauf der Krankheit häufig ist und die meisten Erkrankten vollständig genesen, kommen auch schwere Verläufe beispielsweise mit Lungenentzündung vor, die zum Tod führen können.

Neben dem Vermeiden einer Infektion durch Beachtung der AHA + A + L-Regeln (Abstand halten, Hygiene beachten, Alltag mit Maske, Corona-Warn-App herunterladen, regelmäßiges Lüften) bietet die Impfung den bestmöglichen Schutz vor einer Erkrankung.

## Kîjan derzî tê bikar anîn?

Çend vaksînên hatî pejirandî yê COVID-19 hene ku ev qas ku ji bo parastina takekesî li dijî COVID-19 kêrhatî ne û wekî bersîvek ji bo epidemiyê jî kêrhatî ne. Vaksînên hilgirê COVID-19 ku li vir hatine nîqaş kirin, (Vaxzevria® ji AstraZeneca, berê vaksîna Janssen Cilag International/AstraZeneca® COVID-19) û vaksîna Janssen® COVID-19 ji Johnson & Johnson) vaksînên ser bingeha genetîkî ne ku hilbirîna wan li ser teknolojiya bilind hatiye pêşdîtin kirin. Vaksînên berê hilgir li dijî nexweşiyên din hatine erê kirin

Ev vîrusê ku ji vîrûsên bi navê vîrûsên hilgir çê dibin. Ev vaksîn hilgir ku hatine nîqaş kirin tam hatine lêkolînkirin û nikarin xwe dubare bikin, ev vîrûs zindî nînin. Ji ber vê yekê, kesên vaksînekirî nikarin vîrusên kesên din ji kesên din re veguhezin. Di vîrûsa hilgir de agahdariyên genetîkî ya proteîna vîrusa korona, ku jê re proteîna oşî tê gotin, hene.

Agahdariyên veguheştî ku ji aliyê vîrusa hilgir piştî vaxlêdanê di genoma mirovî de ne tevhev nabe, lê piştî têketinê di şaneyan de (di serî de di şaneyên masûlkeyan de li cihê vaxlêdanê û di hin şaneyên parastinê de) "tê xwendin", di encamê de ev şane proteîna oşîya xwe berhev diken. Proteîna oşîya bixwe nikare bibe sedema tûşîbûna ji SARS-CoV-2 ê re. Proteînên oşî yê bi vî rengî ji aliyê laşê kesê vaksînekirî ve têne hilberandin ji aliyê pergala parastinê ve wekî proteînên biyanî têne zanîn. Wekî encamek, antîbodî û şaneyên parastinê li dijî proteîna oşî ya vîrusê têne hilberandin. Ev rewş bersîvek ewleh ya parastinê diafirîne.

Vîrusa hilgir nikare di laşê mirov de zêde bibe û piştî demek kurt têkdîçe. Piştî wê, ti proteîneke vîrusa zêde (proteîna oşîy) nayê hilberandin.

### Um welchen Impfstoff handelt es sich?

Es sind mehrere Impfstoffe gegen COVID-19 zugelassen, die gleichermaßen geeignet sind, um sich individuell vor COVID-19 zu schützen und die Pandemie zu bekämpfen. Die hier besprochenen COVID-19-Vektor-Impfstoffe (Vaxzevria® von AstraZeneca, ehemals COVID-19 Vaccine AstraZeneca® und COVID-19 Vaccine Janssen® von Janssen Cilag International/Johnson&Johnson) sind genbasierte Impfstoffe, deren Herstellung auf einer modernen Technologie beruht. Vektor-Impfstoffe gegen andere Erkrankungen sind bereits zugelassen.

Die Impfstoffe bestehen aus sogenannten Vektorviren. Das jeweilige Vektorvirus ist ein gut untersuchtes Virus, das sich nicht vermehren kann. Geimpfte Personen können also keine Impfviren auf andere Personen übertragen. Es handelt sich nicht um Lebendimpfstoffe. Das Vektorvirus enthält und transportiert die genetische Information für ein einzelnes Eiweiß des Corona-Virus, das sogenannte Spikeprotein.

Die vom Vektorvirus transportierte Information wird nach der Impfung nicht ins menschliche Erbgut eingebaut, sondern nach Eintritt in die Zellen (vor allem in Muskelzellen an der Impfstelle und in bestimmten Abwehrzellen) „abgelesen“, woraufhin diese Zellen dann das Spikeprotein selbst herstellen. Das Spikeprotein kann für sich allein keine SARS-CoV-2-Infektion auslösen. Die so vom Körper des Geimpften gebildeten Spikeproteine werden vom Immunsystem als Fremdeiweiße erkannt; in der Folge werden Antikörper und Abwehrzellen gegen das Spikeprotein des Virus gebildet. So entsteht eine schützende Immunantwort.

Das Vektorvirus kann sich im menschlichen Körper nicht vermehren und wird nach kurzer Zeit wieder abgebaut. Dann wird auch kein Viruseiweiß (Spikeprotein) mehr hergestellt.

## Vaksîn çawa tê lêdayin?

Ev vaksîn di masûlkeya milê jorîn de tê lêdayin.

Pêdivî ye ku Vaxzevria® du caran were lêdayin. Piştrastkirina herî kêr 4 û herî zêde 12 hefte wekî dema navbera vaxlêdanên 1 û 2 têtê destûr kirin. Ji bo ku gengaziya herî başa vaxlêdanê were parastin, Komîteya Daîmî ya Immunisasyonê li Enstîtuya Robert Koch (STIKO) di navbera vaxlêdanên yekem û duyemîn de herî kêr 9 heta 12 hefte zêdetir navberê pêşniya dike, Ji ber ku encamên lêkolînê bi navberên vaxlêdanê yê dirêjtir ve bandora mezintir nîşan didin.

Niha ji bo vaxslêdana duyemîn, pêdivî ye ku vaxslêdana çêkerî ji aliyê heman vaxslêdana yekem de were bikar anîn. Veqetandek ji bo kesên di bin 60 saliyê de heye ku Vaxzevria® ji bo vaksîneya yekem ji wan re hatiye bikar anîn. Ji bo kesên wusa, STIKO niha pêşniyar dike ku vaksîneya duyemîn 12 hefte piştî vaksîneya yekem a mRNA (Comirnaty® ji BioNTech / Pfizer an COVID-19 Vaccine Moderna® ji Moderna) 9 -12 hefte piştî vaksîna yekem pêk were. Sedema vê pêşniyara kêmbûna, piştî vaksîneya bi Vaxzevria®, meyîna xwînê (tromboz) heta astekê bi kêmbûna hejmara bi kêmbûna plaketan (trombosîtopeniya), bi taybetî di mirovên di bin 60 saliyê de. Ji ber ku ji lêkolînên li ser vê rêzeya vaxslêdanan (vaxslêdana yekem bi Vaxzevria® re û dûv re jî vaxslêdanan 2 bi Comirnaty® an COVID-19 Vaccine Moderna) ti encam tune, STIKO li gorî dîtînan zanistî yên giştî yên der barê Vaxslêdanan de ev pêşniyar dike. Tê texmîn kirin ku bandor û bandorên neyînî bi yên li jêr têne pêşandan re hevber in.

Li gorî pêşniyara STIKO, vaksînebûna duyemîn bi Vaxzevria® re jî piştî ku bi doktorê xwe re şirove bikin û pejirandina kesane ya metirsiyê ji bo kesê ku vaksîne dibe, jî gengaz e.

Vaksîna Janssen® COVID-19 tenê carekê tê dayîn.

#### Wie wird der Impfstoff verabreicht?

Der Impfstoff wird in den Oberarmmuskel gespritzt.

Vaxzevria® muss zweimal verabreicht werden. Die Zulassung ermöglicht als Zeitraum zwischen der 1. und 2. Impfung mindestens 4 und höchstens 12 Wochen. Für einen größtmöglichen Impfschutz empfiehlt die Ständige Impfkommision beim Robert Koch-Institut (STIKO) einen Abstand von 12 Wochen zwischen der 1. und der 2. Impfung, da Studienergebnisse auf eine höhere Wirksamkeit bei längerem Impfabstand hinweisen.

Bei der 2. Impfung muss gegenwärtig der gleiche Impfstoff desselben Herstellers verwendet werden wie bei der 1. Impfung. Eine Ausnahme gilt bei Personen unter 60 Jahren, bei denen bei der 1. Impfung Vaxzevria® verwendet wurde. Für diese Personen empfiehlt die STIKO zurzeit, die 2. Impfung mit einem mRNA-Impfstoff (Comirnaty® von BioNTech/Pfizer oder COVID-19 Vaccine Moderna® von Moderna) 9 bis 12 Wochen nach der 1. Impfung durchzuführen. Grund für diese Empfehlung ist das seltene Auftreten von Blutgerinnseln (Thrombosen) teilweise mit einer Verringerung der Blutplättchenzahl (Thrombozytopenie) vorwiegend bei Personen unter 60 Jahren nach der Impfung mit Vaxzevria®. Da es noch keine Erkenntnisse aus Studien zu dieser Impfserie (1. Impfung mit Vaxzevria® gefolgt von 2. Impfung mit Comirnaty® oder COVID-19 Vaccine Moderna®) gibt, erfolgte diese Empfehlung der STIKO auf der Grundlage allgemeiner wissenschaftlicher Erkenntnisse zu Impfstoffen. Es wird davon ausgegangen, dass Wirkungen und Nebenwirkungen mit den hier im Folgenden dargestellten vergleichbar sein werden.

Laut STIKO-Empfehlung ist auch die 2. Impfung mit Vaxzevria® nach ärztlicher Aufklärung und bei individueller Risikoakzeptanz der zu impfenden Person möglich.

COVID-19 Vaccine Janssen® muss nur einmal verabreicht werden.

## Vaksînekirin çiqas bibandor e?

Di zanîna heyî de, her du vaksînen COVID-19 pir bi bandor in: Vaxzevria® di hemî komên temenê de heta ku navberek 12-heftî li gorî pêşniyara STIKO, hate dîtin, heta %80 bandor nîşan da û vaksîna Janssen® COVID-19 hema hema %65 bandor nîşan da. Ev tê vê wateyê ku gengaziya tûşîbûna kesê vaskînebûyî ji COVID-19 heta %80 (bi Vaxzevria®) an nêzîkî %65 (vaksîna Janssen® COVID-19) kêmtire ji kesê ku vaksîne nebû ye. Di pêşgirtina li nexweşiya giran a COVID-19 (ji bo nimûne dermankirina nexweşxaneyê) de bandor hêj zêdetir bû: hema hema %95 bi COVID-19 Vaxzevria® û nêzîkê %100 bi vaksîna Janssen® COVID-19. Ji ber vê yekê, eger kesek bi vê vaksîna COVID-19 vaskîne bibe, bi patogjenek re têkeve têkiliyê, gengaziyek girîng heye ku ev mirov nexweş nekeve. Vêga nediya e ku ew parastina vaskîne heta kengî berdeyam dibe.

Heta eger hûn werin vaksîne kirin jî, pêwste ku hûn rêzikên AHA + A + L bişopînin da ku xwe û hawîrdora xwe biparêzin. Sedem ev e ku parastin yekser piştî derzîlêdanê dest pê nake û ji hemî

kesên ku hatine vaksîne kirine wekhev peyda tune ye. Wekî din, ka mirov dikare tevî ku hatibe vaksîne kirin, vîrusa (SARS-CoV-2) belav bike, yan na, hêsta nediya e.

#### Wie wirksam ist die Impfung?

Nach derzeitigem Kenntnisstand bieten beide COVID-19-Vektor-Impfstoffe eine gute Wirksamkeit: Bei Vaxzevria® zeigte sich unter Einhaltung des von der STIKO empfohlenen Abstands von 12 Wochen zwischen beiden Impfungen eine Wirksamkeit von bis zu 80 % in allen Altersgruppen, bei COVID-19 Vaccine Janssen® von etwa 65 %. Das bedeutet: Die Wahrscheinlichkeit, an COVID-19 zu erkranken, war bei den gegen COVID-19 geimpften Personen um bis zu 80 % (Vaxzevria®) bzw. um etwa 65 % (COVID-19 Vaccine Janssen®) geringer als bei den nicht geimpften Personen. Die Wirksamkeit in Bezug auf die Verhinderung einer schweren COVID-19-Erkrankung (also zum Beispiel einer Behandlung im Krankenhaus) war noch höher: etwa 95 % bei COVID-19 Vaxzevria® und etwa 100 % bei COVID-19 Vaccine Janssen®. Wenn also eine mit diesem COVID-19-Impfstoff geimpfte Person mit dem Erreger in Kontakt kommt, wird sie mit großer Wahrscheinlichkeit nicht erkranken. Wie lange dieser Impfschutz anhält, ist derzeit noch nicht bekannt.

Auch wenn Sie geimpft sind, ist es notwendig, dass Sie weiterhin die AHA + A + L-Regeln beachten und somit sich und Ihre Umgebung schützen. Gründe dafür sind, dass der Schutz nicht sofort nach der Impfung einsetzt und auch nicht bei allen geimpften Personen gleichermaßen vorhanden ist. Zudem lässt sich zurzeit noch nicht mit Sicherheit sagen, ob Personen das Virus (SARS-CoV-2) trotz Impfung weiterverbreiten können.

### Kî bi taybetî dikare vaksînek dijî COVID-19 bikar bîne?

Gelek vaksîn li dijî COVID-19 hatine pejirandin û ji bo parastina takekesî ya li dijî COVID-19 û berteka pandemîkê bi heman rengî kêrhatî ne.

Di esasê de, babetên jêrîn berdewam dibe, her çiqas, ji ber ku ev vaksîn têra hemû kesan nake, ji bo kesên ku metirsiyek mezîn di tûşî tîpa giran an kujer ê COVID-19 zêdetir di bin metirsiya tûşîbûna SARS-CoV-2 de ne yan kesên ku bi kesên ku ji ber karê xwe di bin xetera tûşîbûna COVID-19 de ne re dikevin têkiliyek nêzik, , pêdivî ye ku werin vaksîne kirin.

Lêbelê, pêdivî ye ku babetên jêrîn were nîşan kirin: Bi vaksîna Vaxzevria® û COVID-19 Vaccine Janssen®, êdî her kes dikare ji aliyê bijîşkê xwe ve were vaksîne kirin. Awarteyên gengazî li jêr têne şirove kirin.

#### Wer profitiert besonders von einer Impfung gegen COVID-19?

Es sind mehrere Impfstoffe gegen COVID-19 zugelassen, die gleichermaßen geeignet sind, um sich individuell vor COVID-19 zu schützen und die Pandemie zu bekämpfen.

Grundsätzlich gilt weiterhin: Solange nicht ausreichend Impfstoff für die Versorgung aller zur Verfügung steht, sollen vordringlich Personen geimpft werden, die entweder ein besonders hohes Risiko für einen schweren oder tödlichen Verlauf von COVID-19 aufweisen, die aufgrund ihrer Berufstätigkeit ein besonders hohes Risiko haben, sich mit SARS-CoV-2 anzustecken oder die engen Kontakt zu besonders durch COVID-19 gefährdeten Personen haben.

Zu beachten ist aber: Mit den Impfstoffen Vaxzevria® und COVID-19 Vaccine Janssen® können sich inzwischen alle Personen bei ihrer Ärztin/ihrem Arzt impfen lassen. Mögliche Ausnahmen werden im Folgenden beschrieben.

### Ji bo kî nabe vaksîne were lêdayin?

Ji ber ku vaksînên hilgir ên COVID 19 ji bo zarok û nûciwanên di bin û heta 17 saliyê de nehatine pejirandin, divê ew bi vaksînekê hilgir ên COVID 19 neyên vaksîne kirin.

Kesên tûşî nexweşiyek çalak a bi tayê (38.5° C û jortir), dibe tenê piştî başbûnê werin vaksîne kirin. Lêbelê, sirlêdayin an taya hinekî bilind (bin 38,5 ° C) nabe sedem ku vaksînekirinê dereng bikeve. Kesên ku ji yek ji madeyên pêkhînerê vaksînekirinê re alerjiya giran hene, nabe werin vaksîne kirinê, ji kerema xwe berî ku vaksînekirinê ji pisporê xweya vaksînê re bêjin. Kesa/ê ku piştî vaksînekirina yekem ber tekeker alerjîka yekser hebe (anafilaksî), nabe vaksîna duyemîn bistîne.

Kesên bêyî kêmasiya parêzbendiyê ku di wan de tûşbûna bi vîrûsa nû ya koronayê hatiye piştrastkirin, dikarin 6 mehan paş başbûnê yan piştî pêhesînê bêne vaksîne kirin û dibe ku tenê dozek vaksînê bistînin, heta eger di hin babetan de zêdetir ji 6 meh ji pêhesînê derbas bibe, tenê dozek têrê dike. Hê nayê zanîn ka doza duyemîn ji bo wan kesan pêwîste yan na. Kesên ku piştî vaxlêdana yekem, tûşbûna bi vîrûsek korona ya nû di wan de hatiye teşxîs kirin, li gorî STIKO vaxlêdana 2emîn dikarin li gorî qanûnê paş 6 mehan piştî enfeksiyonê bistînin. Tu sedem tune ku eger di berê de kesek tûşî vîrûsa korona bibe, vaxlêdan ji bo wî/wê xeternak dibe. Ji ber vê yekê, tu pêdivîyek bijîşkî ji bo qedexê kirina vê berî vaksîneyê tune.

Hêştta tu tecrûbeyê kêrhatî li ser bikaranîna ev vaksînen COVID-19 ya hilgir di maweya ducanîbûnê û şîrdanê de tune ye. Niha STIKO di dema ducaniyê de vaksînekirina gelemperî pêşniyar nake – bêy berçavgirtina tîpa vaksîna COVID-19. Di rewşên takekesî de, helbet gengaz ku vaksîn ji jinên ducanî ku ji sê mehên duyemîn ducaniyê de bi vaksîna (Comirnaty® yan COVID-19 Vaccine Moderna®) tîn pêşniyar kirin, dikarin piştî nixandina rîskê û sûdê û şewirmendiyek baldar, vaksînê bistînin, di nixandina rîskê û sûdê de dibe mercên berê werin berçav girtin ku metirsiyek zêde ji bo maweyek giran ya nexweşiya COVID-19 yan mercên jiyana bi metirsiya bilinda tûşbûna ji SARS-CoV-2 re çê dike.

STIKO qet texmîn nake ku vaksîneya dayikê di dema şîrdanê de ji bo zarokê şirxwar bi xeter bibe.

#### Wer soll nicht geimpft werden?

Da die COVID-19-Vektor-Impfstoffe für Kinder und Jugendliche bis einschließlich 17 Jahre nicht zugelassen sind, sollen sie nicht mit COVID-19-Vektor-Impfstoffen geimpft werden.

Wer an einer akuten Krankheit mit Fieber (38,5 °C oder höher) leidet, soll erst nach Genesung geimpft werden. Eine Erkältung oder gering erhöhte Temperatur (unter 38,5 °C) ist jedoch kein Grund, die Impfung zu verschieben. Bei einer Überempfindlichkeit gegenüber einem Impfstoffbestandteil sollte nicht geimpft werden: Bitte teilen Sie der Impfärztin/dem Impfarzt vor der Impfung mit, wenn Sie Allergien haben. Wer nach der 1. Impfung eine allergische Sofortreaktion (Anaphylaxie) hatte, sollte die 2. Impfung nicht erhalten.

Personen ohne Immunschwäche, bei denen eine Infektion mit dem neuartigen Coronavirus sicher nachgewiesen wurde, können in der Regel 6 Monate nach Genesung bzw. nach der Diagnose geimpft werden und sollen dann lediglich eine Impfdosis erhalten. Auch in Fällen, in denen seit der Diagnosestellung mehr als 6 Monate vergangen sind, reicht eine Impfdosis aus. Ob und wann bei diesen Personen später eine 2. Impfung notwendig ist, lässt sich derzeit noch nicht sagen. Bei Personen, bei denen nach der 1. Impfung eine Infektion mit dem neuartigen Coronavirus sicher nachgewiesen wurde, sollte laut STIKO-Empfehlung die 2. Impfung in der Regel 6 Monate nach Genesung bzw. nach der Diagnose verabreicht werden. Es gibt keine Hinweise, dass die Impfung eine Gefährdung darstellt, wenn man in der Vergangenheit eine Infektion durchgemacht hat. Es besteht also keine medizinische Notwendigkeit, dies vor der Impfung auszuschließen.

Zur Anwendung der COVID-19-Vektor-Impfstoffe in der Schwangerschaft und Stillzeit liegen noch keine ausreichenden Erfahrungen vor.

Die STIKO empfiehlt die generelle Impfung in der Schwangerschaft derzeit nicht – unabhängig von der Art des COVID-19-Impfstoffes. In Einzelfällen kann Schwangeren aber nach Nutzen-Risiko-Abwägung und nach ausführlicher Aufklärung eine Impfung ab dem 2. Schwangerschaftsdrittel mit einem mRNA-Impfstoff (Comirnaty® oder COVID-19 Vaccine Moderna®) angeboten werden. Bei der Nutzen-Risiko-Abwägung sollten Vorerkrankungen, die ein hohes Risiko für einen schweren Verlauf der COVID-19-Erkrankung darstellen, oder Lebensumstände mit einem hohen Risiko, sich mit SARS-CoV-2 anzustecken beachtet werden.

Die STIKO hält es für sehr unwahrscheinlich, dass eine Impfung der Mutter während der Stillzeit ein Risiko für den gestillten Säugling darstellt.

### **Pêşniyarên ji bo kesên ji 60 salî mezintir û kesên di bin 60 saliyê de**

Ji dema danasîna vaksînê ve, di hin rewşên hindik piştî vaksînekirina bi vaksîna Vaxzevria® û COVID-19 Janssen, bi taybetî di mirovên di bin 60 salî de bandorên neyînî yê giran çê bûne (binêrin "Gelo bandorên vaksînê gengaz in?" li jêr) .

**Empfehlungen für Personen ab 60 Jahren und Personen unter 60 Jahren**

Seit Einführung der Impfung kam es sowohl nach der Impfung mit Vaxzevria® als auch mit COVID-19 Vaccine Janssen® in einigen seltenen Fällen, und zwar überwiegend bei Personen in einem Alter unter 60 Jahren, zu schweren Nebenwirkungen (siehe unten „Sind Impfkomplicationen möglich?“).

**STIKO ji bo kesên 60 salî û zêdetir** vaksînekirîan bi vaksîna Vaxzevria® an COVID-19 Janssen® pêşniyar dike. Ev pêşniyar li ser bingeha vê yekê têtê ku bandorek baş ji bo vaksînê barhilgira COVID-19 di vê koma temenê de hatiye nişandan. Wekî din, metirsiya nexweşiya giran a COVID-19 an mirina ji ber COVID-19 ya ciwanan bi girîngî zêdetir e. Di dawiyê de, bandorên neyênî ên hatine gotin li jêr "Gelo bandorên vaksînê gengaz in?" bi tevahî di mirovên di bin 60 salî de pêk tên.

**Für Personen, die 60 Jahre und älter sind**, empfiehlt die STIKO die Impfung mit Vaxzevria® oder COVID-19 Vaccine Janssen®. Diese Empfehlung beruht darauf, dass für die COVID-19-Vektor-Impfstoffe in dieser Altersgruppe eine gute Wirksamkeit gezeigt werden konnte, zudem das Risiko, schwer an COVID-19 zu erkranken oder an COVID-19 zu versterben deutlich höher als bei jüngeren Personen ist und schließlich, dass die unter „Sind Impfkomplicationen möglich?“ beschriebenen Nebenwirkungen ganz überwiegend bei Personen unter 60 Jahren auftraten.

**Ji bo kesên di bin 60 saliyê de**, STIKO pêşniyar dike ku vaksînekirina bi vaksîna Vaxzevria® an COVID-19 Janssen® jî piştî ku bi doktorê xwe re şirove bikin û pejirandina kesane ya metirsiyê ji bo kesê ku vaksîne dibe, jî gengaz e. Ji bo nirxandina metirsiya kesane yê vaksînekirî, divê rîska tevliheviyan şirovekirî û herwusa xetera enfeksiyona bi SARS-CoV-2 an COVID-19 were nirxandin. Ji ber vê yekê, ji aliyekê ve, divê were zanîn ku meyîna xwînê (tromboz), ku li jêr bi kêmbûna jimareya plaketên xwînê (trombocitopeniya) ve têne şirove kirin, carinan (kêmtir ji 0.01% ji kesên vaksînkirî di vê koma temenê de) di kesên li jêr 60 salî li gorî asta zanebûna heyî de ye. Li aliyekê din, divê nirxandinek kesane ji bo tûşbûna ji SARS-CoV-2 (ji bo nimûne, jiyaneke kesane û mercên kar û tevger) an rîskeke kesane ji bo kursa giran û potansiyel a mirinê ya COVID - 19 (ji bo nimûne, ji ber nexweşiyên bingeheîn) zêde dibe.

**Für Personen unter 60 Jahren** ist die Impfung mit Vaxzevria® oder COVID-19 Vaccine Janssen® laut STIKO-Empfehlung nach ärztlicher Aufklärung und bei individueller Risikoakzeptanz der zu impfenden Person ebenfalls möglich. Für die individuelle Risikoabschätzung durch die zu impfende Person sollten einerseits das Risiko der beschriebenen Komplikationen und andererseits das Risiko für eine Infektion mit SARS-CoV-2 oder eine COVID-19-Erkrankung abgewogen werden. Hierfür sollte zum einen beachtet werden, dass die unten beschriebenen Blutgerinnsel (Thrombosen) mit gleichzeitiger Verringerung der Blutplättchenzahl (Thrombozytopenie) nach derzeitigem Kenntnisstand auch bei Personen unter 60 Jahren sehr selten (weniger als 0,01 % der geimpften Personen in dieser Altersgruppe) aufgetreten sind. Zum anderen sollte individuell eingeschätzt werden, ob das persönliche Risiko für eine Infektion mit SARS-CoV-2 (z.B. persönliche Lebens- und Arbeitsumstände und Verhalten) oder das persönliche Risiko für eine schwere und möglicherweise tödliche Verlaufsform von COVID-19 (z. B. aufgrund von Grunderkrankungen) erhöht ist.

**Berî û paşiya vaksînlêdanê divê ez çi bikim?**

Eger piştî vaksînekirina berê an vaksînek din hûn ji hiş çûbin an tûşî alerjiyên yekser bibin, ji kerema xwe doktorê ku vaksîn pêk aniye, agadar bikin. Di vê rewşê de, ew dikare piştî vaksînekirinê ji bo demek dirêj we bişopîne.

Pêdivî ye ku di navbera vaksînên din de herî kêmtir 14 roj derbas bibin.

Eger we nexweşiyek aloziya merandina xwînê hebe yan hûn dermanên dijî merîna xwînê dixwînin ji kerema xwe berî vaksîneyê doktorê xwe agahdar bikin. Bijîşkê we tê ji we re şirove bike ka hûn dikarin bi tedbîrên hêsan vaksîne bibin. Tişteke tune ku li kesên bi parastina bikêmasî pêşî li vaksîneyê bigire. Lêbelê, vaksîne dikare di nav kesên weha de bi bandor nebe.

Eger alerjîk yan di dema borî de we bertekên alerjî hebin, ji kerema xwe berî ku hûn vaksîne bibin ji doktorê xwe re bêjin. Doktorê we dê ji we re bêje ka sedemek heye ku hûn vaksîne bikin yan nekin.

Piştî ku hûn vaksînekirinê werdigirin hewce nake ku hûn bêhna xwe vedin. Eger piştî vaksînekirinê êş an taya we hebe (binêrin "Li paş vaksînekirinê engaze li hember vaksînekirinê çi bertek çê bibe?"),

dibe ku dermanek aramker/ taybir were bikar anîn. Hûn dikarin li ser vê yekê bi bijîşkê malabata xwe re biaxivin.

Eger piştî vaksîneyê hûn tûşî bêntegî, êşa singî, werimandina lîngan, an êşa zikî ya domdar bûn, tariya dîtînê rasterast li bijîşkî bigerin. Eger we piştî vaksîneyê serêşên giran an domdar hebûn, an jî li derveyî cihê derziyê birînek giran an reşatiyek hebe, divê hûn bilez ji bijîjkek bigerin.

#### Wie verhalte ich mich vor und nach der Impfung?

Wenn Sie nach einer früheren Impfung oder anderen Spritze ohnmächtig geworden sind oder zu Sofortallergien neigen, teilen Sie dies bitte der Impfärztin/dem Impfarzt vor der Impfung mit. Dann kann sie/er Sie nach der Impfung gegebenenfalls länger beobachten.

Zu anderen Impfungen soll ein Abstand von mindestens 14 Tagen eingehalten werden.

Bitte teilen Sie der Ärztin/dem Arzt vor der Impfung mit, wenn Sie an einer Gerinnungsstörung leiden oder gerinnungshemmende Medikamente einnehmen. Die Ärztin/der Arzt wird mit Ihnen abklären, ob Sie unter Einhaltung einfacher Vorsichtsmaßnahmen geimpft werden können.

Es spricht nichts gegen eine Impfung bei Personen mit einer Immunschwäche. Es ist jedoch möglich, dass die Impfung bei diesen Personen nicht so wirksam ist.

Bitte teilen Sie der Ärztin/dem Arzt vor der Impfung auch mit, wenn Sie nach einer Impfung in der Vergangenheit eine allergische Reaktion hatten oder Allergien haben. Die Ärztin/der Arzt wird mit Ihnen abklären, ob etwas gegen die Impfung spricht.

Nach der Impfung müssen Sie sich nicht besonders schonen. Bei Schmerzen oder Fieber nach der Impfung (s. „Welche Impfreaktionen können nach der Impfung auftreten?“) können schmerzlindernde/fiebersenkende Medikamente eingenommen werden. Ihre Hausärztin/Ihr Hausarzt kann Sie hierzu beraten.

Begeben Sie sich unverzüglich in ärztliche Behandlung, wenn Sie nach der Impfung Atemnot, Brustschmerzen, Beinschwellungen, anhaltende Bauchschmerzen oder Sehstörungen entwickeln. Suchen Sie auch sofort eine Ärztin oder einen Arzt auf, wenn Sie einige Tagen nach der Impfung starke oder anhaltende Kopfschmerzen haben oder Blutergüsse oder punktförmige Hautblutungen außerhalb der Einstichstelle auftreten.

## Çi cûre bertek piştî vaksînekirinê, çê dibe?

Piştî vaksînekirina bi vaksîna hilgir, dibe ku bertekên demkurt û demkiyê herêmî û gelemperî ku têkiliyên di navbera laş û vaksînê de nîşan didin, çêbibin. Hevdem ev bertek gengaze pêk bên ji tayê, lerezê û nîşanên din ên mîna grîpê. Piştî vaksîne kirinê bi gelemperî di nav çend rojan de kêmbûnê dibin. Ji bo kêmkirina nîşanên gengaz dikarin dermanê êşbir/taybir di dozeya pêşniyarkirî de bikar bînin.

#### Welche Impfreaktionen können nach der Impfung auftreten?

Nach der Impfung mit den COVID-19-Vektor-Impfstoffen kann es als Ausdruck der Auseinandersetzung des Körpers mit dem Impfstoff zu kurzfristigen, vorübergehenden Lokal- und Allgemeinreaktionen kommen. Diese Reaktionen können auch Fieber, Schüttelfrost und andere grippeähnliche Beschwerden sein. Sie klingen für gewöhnlich innerhalb weniger Tage nach der Impfung wieder ab. Zur Linderung möglicher Beschwerden kann ein schmerzlinderndes/fiebersenkendes Medikament in der empfohlenen Dosierung eingenommen werden.

**Vaxzevria®:** Bertekên vaksînê yên herî zêde di lêkolînên erkirî de, hatine ragihandin pêk tên ji hesasiyeta cihê vaksînê (zêdetir ji %60), êşa cihê vaksînê, westîn, serêş û westiyên (zêdetir ji %50), êşa movik (zêdetir ji %40), zêdebûna tay û lerezê (zêdetir ji %30), Dilrabûn û êşa li dora movikan (zêdetir ji %20). Bi piranî (di navbera %1 û %10) de, kêmbûna hejmara pilaketa (trombocitopeniya) xwînê, vereşîn, zikêş, sorbûn û werimîna devera derziyê bi taya kêmbûnê hate dîtîn. Bi piranî (di navbera %1 û %10) de werimîna girikên lîmfê, kêmbûna meyla xwarinê, sergêjî, xwevovîbûn, zêdebûna xûdanê, xwurîna û pîzikên çermî çêdibe.

**Vaxzevria®:** Die am häufigsten berichteten Impfreaktionen in den Zulassungsstudien waren Druckempfindlichkeit an der Einstichstelle (mehr als 60 %), Schmerzen an der Einstichstelle, Kopfschmerzen und Ermüdung (mehr als 50 %), Muskelschmerzen und Unwohlsein (mehr als 40 %), erhöhte Temperatur und Schüttelfrost (mehr als 30 %),

Gelenkschmerzen und Übelkeit (mehr als 20%). Häufig (zwischen 1% und 10%) wurde eine Verringerung der Blutplättchenzahl (Thrombozytopenie), Erbrechen, Durchfall, Rötung und Schwellung der Einstichstelle sowie Fieber beobachtet. Gelegentlich (zwischen 0,1% und 1%) traten Lymphknotenschwellungen, verminderter Appetit, Schwindel, Schläfrigkeit, vermehrtes Schwitzen, Juckreiz und ein allgemeiner Hautausschlag auf.

**Vaksîna bi Janssen® COVID-19:** Bertekên vaksînê yê herî zêde di lêkolînên erkirî de, hatine ragihandin pêk tên ji êşa cihê vaksînê (zêdetir ji %40), serêş, westîn, û êşa masûlkeyan (zêdetir ji %30), dilrabûn (zêdetir ji %10). Bi piranî (di navbera %1 û %10) de tay, kuxîn, eşa movikan, sûrbûn û werimîna cihê derziyê di gel lertzê hatiye ragehandin. Carna (di navbera %1 û %1) de, lertz, bêniştin, êşa qirikê û devî, xwurîna û pîrzişkên çermî, zêdebûna xûdanê, êşa masûlkeyan, êşa pêyan, êşa kemerê, hesta sistbûna giştî û sistbûnê, çêdibe.

Di kesên pîr de kêmtir ji kesên ciwan ev bertek derdikevin. Bertekên vaksînlêdanê bi piranî sivik an navîn in û bi Vaxzevria® piştî vaksînêkirina duyemîn hinekî ji vaksînekirina yekim kêmtir derdikevin.

**COVID-19 Vaccine Janssen®:** Die am häufigsten berichteten Impfreaktionen in den Zulassungsstudien waren Schmerzen an der Einstichstelle (mehr als 40 %), Kopfschmerzen, Ermüdung und Muskelschmerzen (mehr als 30 %) sowie Übelkeit (mehr als 10 %). Häufig (zwischen 1 % und 10 %) wurde über Fieber, Husten, Gelenkschmerzen, Rötung und Schwellung der Einstichstelle sowie Schüttelfrost berichtet. Gelegentlich (zwischen 0,1 % und 1 %) traten Zittern, Niesen, Schmerzen in Mund und Rachen, genereller Ausschlag, vermehrtes Schwitzen, Schwäche der Muskeln, Schmerzen in Arm oder Bein, Rückenschmerzen, allgemeines Schwächegefühl und Unwohlsein auf.

Die meisten Reaktionen sind bei älteren Personen etwas seltener als bei jüngeren Personen zu beobachten. Die Impfreaktionen sind zumeist mild oder mäßig ausgeprägt und treten bei Vaxzevria® nach der 2. Impfung etwas seltener als nach der 1. Impfung auf.

## Gelo dibe ku vaksînekirinê bandor hebe?

Bndorên derziyê ji ber berteka derziyê ye ku ji bertekên normal zêdetir e, ku bi girîngî bandorê li rewşa tenduristiya kesê vaksîne kirî dike.

**Sind Impfkomplikationen möglich?**

Impfkomplikationen sind über das normale Maß einer Impfreaktion hinausgehende Folgen der Impfung, die den Gesundheitszustand der geimpften Person deutlich belasten.

**Vaxzevria®:** Ji destpêkirina vaksîneyê ve, di bûyerên pir kêm de paş vaksîne kirina bi Vaxzevria® ji AstraZeneca® meyîna xwînê (tromboz) bi kêmbûna jimara plaketan (trombocitopeniya) hatine dîtin. Carna bi xwînrîjandinê ye, di rewşên pir kêm (kêmtir ji 0.01%) piştî vaksîneya bi Vaxzevria® de tê dîtin. Di nav van de hin bûyerên giran hene, di nav wan de lebatên xwînê yê li deverên cihêreng an jî ne asayî (tromboza sinusê reh a mejî an di valahiya zikê de), digel vê yekê çalakiya meyîna xwînê an jî zêde bûna xwînrîjîyê di laşî de. Piraniya ev bûyer nava 3 hefteyan piştî vaksîneyê û piranî li kesên di bin 60 salî de pêk tê. Hin bûyerên hatine şirove kirin mirin yan zîyanê mayinde bûn.

**Vaxzevria®:** Seit Einführung der Impfung wurden nach einer Impfung mit Vaxzevria® in sehr seltenen Fällen (weniger als 0,01 %) Blutgerinnsel (Thrombosen), verbunden mit einer Verringerung der Blutplättchenzahl (Thrombozytopenie), teilweise auch mit Blutungen einhergehend, beobachtet. Darunter waren einige schwere Fälle mit Blutgerinnseln an unterschiedlichen oder ungewöhnlichen Stellen (z. B. im Gehirn als Sinusvenenthrombosen oder auch im Bauchraum), zusammen mit erhöhter Gerinnungsaktivität oder auch Blutungen im ganzen Körper. Die Mehrzahl dieser Fälle trat innerhalb von 2 bis 3 Wochen nach der Impfung und überwiegend bei Personen unter 60 Jahren auf. Einige der beschriebenen Fälle endeten tödlich oder mit bleibendem Schaden.

**Vaksîna Janssen® COVID-19:** Bertekên zêde yê hestiyarî û luyî di rewşên kêm de (0.01% heta 0.1%) pêk hatine. Wekî din, piştî vaksînekirina bi vaksîna Janssen® COVID-19, meyîna xwînê (ji bo nimûne, di mejî de wekî tromboza reha sinus an herwisa di valahiya zikê de) digel kêmbûna jimareya plaketên (trombocitopeniya) xwînê hate dîtin. Bûyerên pir kêm (Ji 0.01% kêmtir) di nav de di hin rewşên bi mirinê jî hene. Ev rewş di 3 hefteyên vaksînekirinê de û bêtir di kesên di bin 60 salî de pêk tê. Ev babet niha di bin lêkolîna deqîq de ne.



Ji dema destpêkirina vaksînê, bertekên alerjîk ên lezgîn (bertekên anafilaktîk) di rewşên pir kêm de hatine rapor kirin. Ev piştî vaksîne kirinê demek kurt rû diden û pêdivî bi dermankirina bijîşkî heye. Hemî ev vaksîne kirin, di rewşên pir kêm de derketina berteka alerjiya yekser, wekî şokê, an jî bandorên din ên berê yê nediya, bi yeqîn nayên red kirin.

Di bûyera derketina nîşanên piştî vaksînekirinê de, ku ji bertekên normal ên demkî yê beşî û gelemperî zêdetir in, dê bijîjkê malbata we bi xwezayî ji bo şewirê berdet be. Di rewşa bandorên giran de, bi taybet bêtengî, êşa singî, werema pêyan yan êşa zikî ya berdewam, yan tevheviya dîtinê, an jî eger we serêşa zêde yan domdar yan çend rojan piştî vaksîneyê reşbûna qalikî yan xwînrejiya derveyî cihê derziyê heb, ji kerema xwe bilez ji bijîşkî bigerin.

**COVID-19 Vaccine Janssen®:** In seltenen Fällen (0,01 % bis 0,1 %) traten Überempfindlichkeitsreaktionen und Nesselsucht auf. Darüber hinaus wurden nach einer Impfung mit COVID-19 Vaccine Janssen® in sehr seltenen Fällen (weniger als 0,01 %) Blutgerinnsel (z.B. im Gehirn als Sinusvenenthrombosen oder auch im Bauchraum) verbunden mit einer Verringerung der Blutplättchenzahl (Thrombozytopenie) und bei einem Teil mit tödlichem Ausgang beobachtet. Diese Fälle traten innerhalb von 3 Wochen nach der Impfung und überwiegend bei Personen unter 60 Jahren auf. Diese Fälle werden aktuell sorgfältig geprüft.

Seit Einführung der Impfung wurden in sehr seltenen Fällen allergische Sofortreaktionen (anaphylaktische Reaktionen) berichtet. Diese traten kurz nach der Impfung auf und mussten ärztlich behandelt werden.

Grundsätzlich können – wie bei allen Impfstoffen – in sehr seltenen Fällen eine allergische Sofortreaktion bis hin zum Schock oder andere auch bisher unbekannte Komplikationen nicht ausgeschlossen werden.

Wenn nach einer Impfung Symptome auftreten, welche die oben genannten schnell vorübergehenden Lokal- und Allgemeinreaktionen überschreiten, steht Ihnen Ihre Hausärztin/Ihr Hausarzt selbstverständlich zur Beratung zur Verfügung. Bei schweren Beeinträchtigungen, insbesondere Atemnot, Brustschmerzen, Beinschwellungen, anhaltenden Bauchschmerzen oder Sehstörungen oder wenn Sie einige Tage nach der Impfung starke oder anhaltende Kopfschmerzen haben oder Blutergüsse oder punktförmige Hautblutungen außerhalb der Einstichstelle auftreten, begeben Sie sich bitte unverzüglich in ärztliche Behandlung.

Wekî din, hûn dikarin bixwe bandorên kêlekî ragihînin: <https://nebenwirkungen.bund.de>

Es besteht die Möglichkeit, Nebenwirkungen auch selbst zu melden: <https://nebenwirkungen.bund.de>

**Digel vê belavoka ragihandinê, pisporê vaksînê dê derfetê bide we ku hûn ji bo zelalkirinê bi wî re bipeyivin.**

In Ergänzung zu diesem Aufklärungsmerkblatt bietet Ihnen Ihre Impfärztin/Ihr Impfarzt ein Aufklärungsgespräch an.

Nivîs:

Anmerkungen:

Cih, Roj

Ort, Datum

Îmzeya pispor

Unterschrift Ärztin/Arzt

Îmza kesa/ê ku vaksînê werdigire an jî eger kesa/ê ku vaksîne dibe ne şareze be

Ji bo razîbûnê:

Îmzeya nûnerê qanûnî

(Sergêr, Pêşkêşkerê Alîkariya Hiqûqî an Çavdêr)

Unterschrift der zu impfenden Person

bzw. bei fehlender Einwilligungsfähigkeit der zu impfenden Person:  
Unterschrift der gesetzlichen Vertretungsperson  
(Sorgeberechtigte, Vorsorgeberechtigte oder BetreuerIn)

Enstîtuya Paul Ehrlich (PEI) bi rêya sepana telefona hîşmenda SafeVac 2.0 rapirsiyekê li ser pejirandina vaksînê ji bo parastina li dijî vîrûsa korona ya nû (SARS-CoV-2) birêve dibe. Hûn dikarin di nava 48 saetan piştî vaksîneyê qeyd bikin. rapirsî dilxwazî ye.

Das Paul-Ehrlich-Institut (PEI) führt eine Befragung zur Verträglichkeit der Impfstoffe zum Schutz gegen das neue Coronavirus (SARS-CoV-2) mittels Smartphone-App SafeVac 2.0 durch. Sie können sich innerhalb von 48 Stunden nach der Impfung anmelden. Die Befragung ist freiwillig.



Google Play App Store    App Store Apple

Hûn dikarin li ser navnîşanên jêrîn bêtir agahdarî li ser vaksîna COVID-19 bibînin.

Weitere Informationen zu COVID-19 und zur COVID-19-Impfung finden Sie unter

[www.corona-schutzimpfung.de](http://www.corona-schutzimpfung.de)

[www.infektionsschutz.de](http://www.infektionsschutz.de)

[www.rki.de/covid-19-impfen](http://www.rki.de/covid-19-impfen)

[www.pei.de/coronavirus](http://www.pei.de/coronavirus)

### Çapa 1 Guhertoya 006 (ji roja 12-ê Gulana 2021-an)

Ausgabe 1 Version 006 (Stand 12. Mai 2021)

Ev belavoka ragehandinê j aliyê Deutsches Grünes Kreuz e.V, Marburg bi alîkariya Enistîtûya (Robert-Koch) Berlin, hatiye berhv kirin û mafê çapa vê parastiyê. Tenê dikare di nav hedefa xwe de ji bo karanîna ne-bazirganî were belavkirin û veguheztin. Her guherandin an serastkirinek qedexê ye.

Dieses Aufklärungsmerkblatt wurde vom Deutschen Grünen Kreuz e.V., Marburg in Kooperation mit dem Robert Koch-Institut, Berlin erstellt und ist urheberrechtlich geschützt. Es darf ausschließlich im Rahmen seiner Zwecke für eine nicht-kommerzielle Nutzung vervielfältigt und weitergegeben werden. Jegliche Bearbeitung oder Veränderung ist unzulässig.



in Kooperation mit



Sabiqeya bijîşkî ji bo vaksînekirina pêşîlêgirtinê li hemberê COVID-19-ê – bi vaksena hilgir – (Vaxzevria®, berê vaksîna AstraZeneca COVID-19 ji AstraZeneca û vaksîna Janssen® COVID-19 ji Janssen Cilag International/Johnson & Johnson)

Anamnese zur Schutzimpfung gegen COVID-19 (Corona Virus Disease 2019) – mit Vektor-Impfstoff – (Vaxzevria®, ehemals COVID-19 Vaccine AstraZeneca von AstraZeneca und COVID-19 Vaccine Janssen® von Johnson & Johnson)

### 1. Ma we<sup>1</sup> niha nexweşiya giran bi tayê heye?

0 Erê

0 Na

1. Besteht bei Ihnen<sup>1</sup> derzeit eine akute Erkrankung mit Fieber?

0 ja

0 nein

### 2. Gelo hûn<sup>1</sup> niha li hember COVID-19 hatine vaksînekirin?

0 Erê

0 Na

Eger erê, kengî û kîjan vaksîne:

Roj:

Vaksîne:

*(Ji kerema xwe di dema vaksînelêdanê de karta xweya vaksînelêdanê yan her belgeyek din a vaksînelêdanê bi xwe re bînin.)*

2. Haben Sie<sup>1</sup> bereits eine Impfung gegen COVID-19 erhalten?

0 ja

0 nein

Wenn ja, wann und mit welchem Impfstoff? Datum:

Impfstoff:

*(Bitte bringen Sie Ihren Impfausweis oder anderen Impfnachweis zum Impftermin mit.)*

### 3. Eger we<sup>1</sup> dozeya yekem a vaksîna KOVÎD-19 standibe: Gelo we<sup>1</sup> piştî wê bertekê alerjiya hebû?

0 Erê

0 Na

3. Falls Sie<sup>1</sup> bereits die 1. COVID-19-Impfung erhalten haben: Haben Sie<sup>1</sup> danach eine allergische Reaktion entwickelt?

0 ja

0 nein

### 3. Gelo hûn<sup>1</sup> tûşî nexweşiyên demdirêj an nivîşkaniya êminiyê yî? (wek mînak bi riya Kîmiya dermanî, dermana serkutkera ewlehiyê yan dermanên din)?

0 Erê

0 Na

3. Falls Sie<sup>1</sup> bereits die 1. COVID-19-Impfung erhalten haben: Haben Sie<sup>1</sup> danach eine allergische Reaktion entwickelt?

0 ja

0 nein

### 4. Gelo bêguman hatiye îspat kir ku hûn berê tûşî vîrûsa Korona (SARS-CoV-2) bûne? (Piştî tûşîbûna ji SARS-CoV-2, vaksîne ji 6 mehan zûtir piştî başbûn an pêhesînê tê pêşniyar kirin.)

0 Erê

0 Na

Eger bersiva te Erê ye, kengî?

4. Wurde bei Ihnen<sup>1</sup> in der Vergangenheit eine Infektion mit dem neuartigen Coronavirus (SARS-CoV-2) sicher nachgewiesen? (Nach einer Infektion mit SARS-CoV-2 wird empfohlen, die Impfung frühestens 6 Monate nach Genesung bzw. Diagnosestellung durchzuführen.)

0 ja

0 nein

Wenn ja, wann?

**5. Gel hûn tûşî nexweşiyên kronîk an kêmasiya parêzbendiyê-ê ne (ni bo nimûne ji ber kîmyadermanî, tepsîna pergala parêzbendiyê yan dermanên din)?**

0 Erê

0 Na

Eger bersiva te Erê ye, kîjan?

5. Haben Sie<sup>1</sup> chronische Erkrankungen oder leiden Sie<sup>1</sup> an einer Immunschwäche (z.B. durch eine Chemotherapie, immunsupprimierende Therapie oder andere Medikamente)?

0 ja

0 nein

Wenn ja, welche?

**6. Gelo we<sup>1</sup> kêşeya rawestana Xwînê heye an dermanê Rînkê û zelalkera xwînê bi kar tîni?**

0 Erê

0 Na

6. Leiden Sie<sup>1</sup> an einer Blutgerinnungsstörung oder nehmen Sie blutverdünnende Medikamente ein?

0 ja

0 nein

**7. Gelo we<sup>1</sup> alerjiyeke (Hestiyarî) naskirî heye?**

0 Erê

0 Na

Eger bersiva te Belê ye, çi cûreyek

7. Ist bei Ihnen<sup>1</sup> eine Allergie bekannt?

0 ja

0 nein

Wenn ja, welche?

**8. Gelo we<sup>1</sup> piştî vaksînekirina cudaya pêşîn, nîşaneyên alerjîk, taya zêde, jixweçûn an bertekên din ên ne-asayî qet tecrûbe kiribûn?**

0 Erê

0 Na

Eger bersiva te Belê ye, çi cûreyek

8. Traten bei Ihnen<sup>1</sup> nach einer früheren, anderen Impfung allergische Erscheinungen, hohes Fieber, Ohnmachtsanfälle oder andere ungewöhnliche Reaktionen auf?

0 ja

0 nein

Wenn ja, welche?

**9. Ji bo jinên di temenê zarokbûnê de: Ma hûn niha ducanî ne yan jî şîrê xwe didin<sup>1</sup>?**

0 Erê

0 Na

9. Bei Frauen im gebärfähigen Alter: Besteht zurzeit eine Schwangerschaft oder stillen Sie<sup>1</sup>?

0 ja

0 nein

**10. Gelo hûn<sup>1</sup> di 14 rojên bihurî da hatine vaksînekirin?**

0 Erê

0 Na

10. Sind Sie<sup>1</sup> in den letzten 14 Tagen geimpft worden?

0 ja

0 nein

**<sup>1</sup>Nûnerê qanûnî jî dikare bersivê bide.**

<sup>1</sup> Ggf. wird dies von der gesetzlichen Vertretungsperson beantwortet

## Razîname derbarê Vaksînekirina pêşîlêgirtinê li hemberê COVID-19-ê - bi vaksena hilgir – (Vaxzevria®, berê vaksîna AstraZeneca COVID-19 ya AstraZeneca û vaksîna Janssen® COVID-19 ya Johnson & Johnson)

Einwilligungserklärung zur Schutzimpfung gegen COVID-19 (Corona Virus Disease 2019)

– mit Vektor-Impfstoff – (Vaxzevria®, ehemals COVID-19 Vaccine AstraZeneca von AstraZeneca und COVID-19 Vaccine Janssen® von Johnson & Johnson)

**Navê kesê/kesa ku tê vaksînekirin (Paşnav, nav):**

Name der zu impfenden Person (Name, Vorname):

**Rojbûn:**

Geburtsdatum:

**Navnîşan:**

Anschrift:

Eger kesa/ê ku vasîne dibe ne mafê radestkirina razînameyê tune ye, nûnerê qanûnî dê razîbûna vaksînekirinê yan nerazîbûna vaksînekirinê ragihîne. Di rewşek wusa de, ji kerema xwe nav û hûngiliyên têkiliyê yên nûnerê hiqûqî jî bidin:

Ist die zu impfende Person nicht einwilligungsfähig, erfolgt die Einwilligung in die Impfung oder die Ablehnung der Impfung durch die gesetzliche Vertretungsperson. Bitte in diesem Fall auch Namen und Kontaktdaten der gesetzlichen Vertretungsperson angeben:

**Nav, paşnav:**

Name, Vorname:

**Hejmara têlefonê:**

**Email:**

Telefonnr.:

E-Mail:

Ez li ser naveroka pelê agahdariyê hîn bûm û derfet çêbû ku ez bi pispore xweya vaksîne re axavtinek berfireh bikim.

Ich habe den Inhalt des Aufklärungsmerkblattes zur Kenntnis genommen und hatte die Möglichkeit zu einem ausführlichen Gespräch mit meiner Impfärztin/meinem Impfarzt.

**Min pirsek din tune.**

Ich habe keine weiteren Fragen.

**Ez derheqê vaksînekirina pêşniyarê li hemberê COVID-19ê bi vaksena hilgir razî me**

Ich willige in die vorgeschlagene Impfung gegen COVID-19 mit Vektor-Impfstoff ein.

**Ez bi vaksînekirinê nerazî me**

Ich lehne die Impfung ab.

**Ez bi eşkere dev ji axaftina li ser zelaliya bijîşkî berdidim**

Ich verzichte ausdrücklich auf das ärztliche Aufklärungsgespräch.

**Nivîs:**

Anmerkungen:

Cih, Roj:

Ort, Datum

Îmzeya kesa/êku vaksînê werdigire  
An eger kesa/êku vaksînên dibe ne şareza be

Ji bo radestkirina razîbûnê bişînin:

Îmzeya nûnerê qanûnî (sergêr,  
Pêşkêşkerê lênêrîna hiqûqî an lênêrînê

Unterschrift der zu impfenden Person  
bzw. bei fehlender Einwilligungsfähigkeit der zu  
impfenden Person:  
Unterschrift der gesetzlichen Vertretungsperson  
(Sorgeberechtigte, Vorsorgeberechtigte oder BetreuerIn)

Îmzeya pispor

Unterschrift der Ärztin/des Arztes

Ev forma sabiqeya bijîşkî û razîname ji aliyê Deutsches Grünes Kreuz e.V., Marburg bi alîkariya Enistîtûya (Robert-Koch) Berlin, hatiye berhv kirin û mafê çapa vê parastîye. Tenê dikare di nav hedefa xwe de ji bo karanîna ne-bazirganî were belavkirin û veguheztin. Her guherandin an serastkirinek qedexe ye.

Dieser Anamnese- und Einwilligungsbogen wurde vom Deutschen Grünen Kreuz e.V., Marburg in Kooperation mit dem Robert Koch-Institut, Berlin erstellt und ist urheberrechtlich geschützt. Er darf ausschließlich im Rahmen seiner Zwecke für eine nicht-kommerzielle Nutzung vervielfältigt und weitergegeben werden. Jegliche Bearbeitung oder Veränderung ist unzulässig.

Weşanger: Deutsches Grünes Kreuz e.V., Marburg  
Bi hevkarîya Enstîtûya Robert Koch, Berlin  
Çapa 001 Guhertoya 002 (Roja 1-ê Nîsana 2021-an)  
Herausgeber Deutsches Grünes Kreuz e.V., Marburg  
In Kooperation mit dem Robert Koch-Institut, Berlin  
Ausgabe 001 Version 002 (Stand 01. April 2021)